Bixêrhatina we dixwazin yên ku **Kurdiska/kurmanji**

Darîzanka malbatê (Familjeportalen) bi kar tînin

-pirsgeh (ekspedîsyon) tu caran naye girtin!

Dest bi karanîna darizanka malbatê (familjeportalen)

Tu yê werê darîzanka malbatê bi riya http://familjeportalen.landskrona.se

Agahiya destûra te ya têketinê de wê hesabê bi kar anîna kesî ya te wê were vekirin. *Li ser agahiya destûra têketina xwe hezir bike (weke ew kaxezê ku te cuda wergirtî) ev belgeya bi qîmet divêt bi emin bêt parastin û nekeve destê kesên bêselahîyet de.*

Wekê te hesabê xwe yê ku tu bikartîne vekir, tu dikar e

-Bi hesanî guhertinên di derbarê şemaya zaroka xwe di bin sernivîsa "Schema" de bike.

-Agahiya di derbarê bê ma kîjan zarok/xwendekar di beşê ku zaroka te têde hene û di heman demêde hijmara telefon û navnîşana wan di bin sernivîsa "Placeringslista" de tu dikare bibîne.

-Di bin sernivîsa "Uppsägning av plats" de ciyê çavdêriya zarokê (barnomsorg) betal bike.

Dibin sernivîsa "Min Barnomsorg" tu dikar e

-Fatûrê xwe bi şopîne, kontrol bike,

-Xercên çavdêriya zarokan hesab bike,

-Daxwaza cih bike,

-Ew ciyê ku te daxwaz kiriye bişopîne,

-Agahiyên hatina (meaş) xwe biguherîne.

Dibin sernivîsa "Mina sidor" tu dikar e

-Dibin agahdariya têkilîya guherînê "Ändra kontaktuppgifter" de navnîşana xwe ya elektronîk (e-postadress) haydar bike.

Dibin sernivîsa "Min profil" de tu dikare

Ji bo ku bikaribe bikevê Darîzanka malbatê (Familjeportalen) gotina xwe ya veşartî (şifre an jî kod) biguherîne.

Guheztina ji pêşdibistanê bo sinifa pêşdibistanê bi ciyê dema mala vala (Fritidshemsplats)

Ji ber vê guhertina wiha divêt tu weke dêbav an jî weliyê zarokê be heta tu bikaribe ciyê zarokê yê di pêşdibistanê betal bike û piştre daxwaza cih li mala dema vala bike.

Daxwaziya xwe tu dikare dibin qoziya "Min barnomsorg-Ansökan" bike.

Şemayê biguherîne an dev ji şemaya nû berde

Ji bo guhertinekê an jî şemaya nû di şûnde bihêle û li ser "Schema" bi tiqîne û agahdariyan bişopîne. Darîzanka malbatê (Familjeportalen) ji bo guhertinên kurtedemkî û bêhnvedanê (semester) naye qeyd kirin. Di vî derbarî de heya wan kesên (personal) ku di vî beşî de pê bêxe eynî weke ku te berî niha kirî bike.

Ji bo te, ew kesê ku çavdêriya zarokê parvekirî bîne bîra xwe û şemaya wan herdû heftiyên ku zarok li ba te di şemayê de binivîse.

Pirsyar?

Pirsên te li ser kar anîna Derîzanka malbatê (Familjeportalen) de hebe, ji kerema xwe bi berpirsyar, karbidest û personalên devera pêşdibistan (förskola) an jî mala dema vala (fritidshem) bipirse wî çaxî ewê çi alîkarî pêwist be wê bidin te.

Agahiyên zêde

Tu dikare agahiyên zêde bê çawa tu Darîzanka malbatê (Familjeportalen) bi kar tîne û di malpera Familjeportalen de di aliyê pêşîde tu dikare bibîne.

Agahdariya destura têketina kesî (Personlig inloggningsuppgift)

Agahiya destura têketinê (inloggningsuppgift) bes dibe bide dayin ji bo dêbav, serpiriştên zarokan an weliyên wan.

Hizir bike û bîne bîra xwe divêt agahiya destura têketinê herdem kesî (şexsî) be!

Zêdetirîn agahiya destura têketinê (Inloggningsuppgift)

Di aliyê pêşî/serrûpelê Darîzanka malbatê (Familjeportalen) de çêdibe ku daxwaziya zêdetirîn di derbarê agahdariya destura têketinê de (heger bêt xwestin) lê herweha heke serpirişt, dêbav an jî weliyê zarokê vê bixwaze.

Översättare: Mem Dogala